Veşartoka ala ya Türkiye

Cankurd

March 13, 2009

Nasdartirîn nîşana Masonî

Wekî em ji dîroka Turkan dizanin, ala ya wan nîşana derketina heyva serê meha Koçî "Hicrî" ye, ku bi Erebî jê re "Hîlal" tê gotin, di gola xûnê de … Wilo tê gotin, û her kesek jî wê çêrokê bawer dike, ku Sultanê Osmanî an Ataturk li dawiya rojekê di cengê de wilo ponijiye, hingê zevîn bi xûna kuştiyan sor bûbû, û asîmanê şergehê jî rengê sor ê rojavyê veda bû…

Heyva seriyê meha Koçî "Hicrî" li ba Musilmanan piçekî giringe, ji ber ku salname ya wan li ser bingeha mehên heyvê pêda bûye, di Qurana pîroz de li ser "heyva taze ji dayîk bûye" tê hewaldan, ku ew deman dide xuyakirin… û ji ber wê yekê Musilmanan "Dem" li gor qonaxên pêvaçûya heyvê di dora zevînê re parve kirin û navin cihêcihê bo 28 pileyên wê pêdakirin.

Li dawiya mehê wekî "C"

Hîn ji destpêka belavbûna Islamê de heyv sireke giring di jiyana Musilmanan de dilîze, hem bo salname ya wan û hem jî bo destpêk û dawîkirina meha Rojiyê, lê belê ew ne tiştekî "Muqeddese", û Xwedê teala ferman daye: "Bo Royê û heyvê secde neke."

Gava em baş li van wêneyan binêrin, emê bibîn kudi destpêka mehê de aliyê rastê yê heyva taze derketî bi rohnî ye, aliyê çepê di tariyê de ye, û li dawiya mehê tersî wê rewşê ye, aliyê çepê bi ronahiye û aliyê rastê di tariyê de. Serê meha koçî wilo dixuye, ku kevana heyvê bi aliyê çepê de ye û li dawiya mehê bi aliyê rastê de ye... Li ba Ereban heyv a taze wekî tîpa wan "R - ر" e... Gava em li nexşên îslamî yên Kevin binêrin, an li ser dîwarên mizgeftên wan, li derve û li hinder, an jî li ser xalî û sicadeyên Musilmanan, emê heyva îslamî, ya seriyê meha Koçî bibînin, ne ya ku tersî wê ye, û wekî tîpa "C" tê xuyakirin.

Li seriyê mehê wekî "R- ر" a Erebî

Gava em li ala dewleta Turkan binêrin, emê bibînin, ku heyva wê ne wekî ya Musilmanan e, kevana heyva wan tersî ya Musilmanane, ber bi aliyê çepê ve ye. Li ser vê yekê, ala kurdî di dema serhildana Şêx Mahmûd Berzencî de wilo bû. Di sala 1905ê de, ku Şêx Mubarek Alahmed mîrê Kuweytê bû, Ingilîzan bo wî alayek pêşniyaz kirin, ku li ser wê heyveke îslamî li ser bû, hema ya Turkan tersî wê û tersî ya Kurdî bû.

Ala ya Kurdî ya berê ya bo Kuweytê pêşniyazkirî bû
Ala ya Turkan a niha

Bo çi heyva ku nîşan û durişmeke salname ya îslamî ye, wilo hatiye teqlekirin, an bervajîkirin û sernexûn û devberjêrkirin? Wekî li ser Qalpağa "Kalpaka !" mezinên Turkan di dema roxandina dewleta Osmanî de..

Bê guman tiştek di bin vê yekê de heye, ku li ba Turkên, ji sibê ta bi êvarê, xwe wekî rêberên cîhana îslamî û hilgirên Xîlafeta "Paşetiya" Îslamê dibînin, ev guhartin pêda bûye…

Paş wê guhartinê, wekî ya Turkan, ya hinek welatên Musilman ên din jî ber bi çep bûye, û ne dûr e ku ew guhartin di bin hikariya ala Turkan de çêbûye, ji ber ku gelek salan paş roxandina "Xîlafeta Osmanî" hîn pir Musilman di wê baweriyê de mabûn, ku Turk stun û hilgirên barê "Neteweya Musilman"in. Li hinde welatên dî jî ev guhartin pêda bû, ji wan jî Tûnis, Azerbaycan û Maliziya.

Azerbaycan

Tûnis

Malîziya

Sîngapor

Ne tenê ev heyva ber bi Çep bo hinde dewletên Musilmanan bi kar hatiye, ew bo saziya ,,Heyva Sor a Navneteweyî" jî bi kar hatiye, ku wekî ,,Xaça Sor a Navneteweyî" li cîhanê bûye sîmbola arîkariyê di welatên Musilmanan de.

Sîmbola Heyva Sor a Cîhanî

Ev guhartin ji ku ve hatiye?

Li ba tevger û desteyên Şeytanî, ku pir ji zû ve baweriya wan bi serdestiya Şeytan di gerdonê de tê, û ji xwe re xudîkekî hêzdar ê bi navê "Baphomet" ji fantazî û pêjiniyê pêda kirine, û heyva bi ronahî ji xwe re kirine sîmbolek ji sîmbolên xwe yên serekîn, baweriya bi xortbûna tariyê heye, bêtir bi ya ronahiyê, lew re li ba wan heyv a ber bi binvebûna mehê giringtire ji ya destpêka mehê, an jî bi rohniya serê mehê. Her tiştekî bervajî lib a wan baştir û diristire, ewana kirasên xwe jî bervajî li xwe dikin… Ev rûdayîna ber bi tariyêû tersbûn û bervajkirinê, di symbol û teviya çandeya wan Bafomêtperestan de baş diyare.

Gava li wêneyê Baphmet binêrin, ku me di serî de daniye, emê yekser bibînin, ku destekî wî bi jor ve, bi hafa seriyê xwe ve, ber bi heyveke bi ronahî ve nîşan dike û destekî wî bi xarê de, ber bi heyveke tarî ve nîşan dike. Kevana heyva li jor ber bi Çepe û ya heyva li jêr ber bi Raste. Li ser pirtûkên wan, nexş û dergahên perestgehên wan jî va teherê nîşanê xuyaye.

Li ba desteyên sihirbaziyê jî, pir ji zû ve, hinek nîşan bi kar tên, yek ji wan heyva kême û stêrke. Li ba hinek olên kevnare jî heyva ber bi kêmbûnê ve diçe, ku di Qurana pîroz de bi "Alu'rcûnl qedîm" û di zimanê Çînî de bi "Yîn" tê navkirin, nîşana Diyana ye. Diyana xudîka Heyve, û Stêrk, ku di zimanê Çînî de bi "Yang" tê navkirin, nîşana xudîka evînê "Vênûs" e, û lew re peyva "Yîn Yang" wilo di cîhana çandeya mirovî de bi nav û denge. Hem Şeytanperestan, hem tevgera Masonî û hem jî tevgera Nazî ya, ku Hitler qirkirina hinek nijadên mirovî wekî histobariyeke ji Xwedê de bi wî hatiye pesartin dizanî û bi aşkereyî ew ramana xwe ya hovbaz bi cîh dihanî…

Gava em li vê wêneyê binêrin, emê van nîşanan binasin: Heyva sernexûnkirî, stêrka Dawûdê Ciho ku şeşperkî ye, stêrka nehperkî, xaça sernexûnkirî û xaça qilûç ku nîşana Naziya Hitlerî ye… û hîn pir zû ve wekî nîşana gelên Arî li ser hinek pûtperestên bakurê Hindistanê hatiye nexişkirin…

Li ba Masoniyê

Li ba olên kevnare

Tevgera Masonî, ku armanca wê cîhanî ye, bo xwe gelek nîşanan bi kar tîne, ji wan jî: mûmdan, agirdan, ro, heyva ber bi Çep, xaç, stêrka şeşperkî û tîpa (J), ku bi Almanî (Y) tê xwendin û kurtepeyva "Yehûd" ye… Xaç li xarê wekî xwe maye, û ne dûre bo xapandina Filehan wilo maye… Di van wêneyên din de hinek dî hatîne diyarkirin, ji wan jî nîşana "Gur", ku Turk bi destê xwe û bi du tiliyan pêda dikin. Mixabin, partiyekî ramiyarî ji partiyên me yên rojavayê Kurdistanê yek ji van sîmbolan, hespê bi du basikan, ku Kurd jêre "Duldul" dibêjin, ji xwe re wekî sîmbol bi kar aniye, û dibe jî ewên ew hesp hilbijartine, tew nizanin ku ew yek ji sîmbolên wan desteyên veşartî

yên kevnare ye… Ewana dibêjin ku eve nîşaneke kurdî ya kevnare ye…



Hîn di dema Osmaniyan de, mestirîn civata Masonî ya rojhilatî li Beyrûtê bû, û hîngê Lubnan di bin destê Osmaniyan de bû. Navê wê civatê "Alhîlal" bû, ku bi Kurdî "Heyv"e. Hinek zana û roşenbîr ên wê civatê, yek ji wan jî nivîskar û çêrokbêjê navdar Curcî Zêdan bû, ku bi xwe Fileh bû, hema bêtirê karê wî li ser dêmguhartina dîrok û kesaniyên îslamî bû, kanî bû yek ji navdartirîn kovarên bi Erebî bida weşandin û belavkirin, ku ta niha hikariya wê di çêrokbêjî û dîroknasiya Ereban de mayî. Heyva wî jî wekî ya Masoniyan û wekî ya ala Turkan ber bi Çep bû.

Ala Saziya Suwarên Malta Yek ji zincîrkên navdar

Li Malta saziyeke çekdar a li ser rêgah û rêbaza Masonî di dema dewleta Osmanî de hebû, ku ala leşkerê wê yê di zireyê 'behrê' de, bi du heyvên sipî û du stêrkên zer bû, herdu heyv wekî ya dewleta Turkan ber bi aliyê Çep de bûn. Vê saziyê hêriş ser keştiyên Musilmanan dikir, ewana talan dikirin, mirovên têde tev dikuştin an bi hovîtî didan ber leşwêrankirinê, ta canê xwe ji dest didan an jî wekî kole bi xwe re dibirin, û wan keştî disotandin an jî ji xwe re distandin…

Wekî dixuye, gava dewleta Osmanî jar bûye û li Europa bi navê "Mêrê nesax" dihate nasîn, Masoniyan bi rêya "Itîhad û Tereqî" li Salonîk û Traqiye bizavên xwe yên mezin kirin, ku deslata Sultan Abdulhemîd ê duwê bi destê xwe vebînin û biroxînin, eve jî yek ji biryarên pilana ku bi navê "Protokolên Hişmendên Zayon" e, ku berî destpêka sedsala 20ê di kongireya xwe ya bi dizî de

biryar kiribû… û kanîn birayê mezin ê Sultan jî, ku bi navê Murad ê pêncemîn bû, bikin endamê civata xwe. Hinek wê demê bi "Dema Zêrîn" a Masoniya navneteweyî didin navkirin.

Wekî wan kanî bûn navdartirîn sîmbolên xwe li ser Dollarê Amerîkî bicîh bikin, wilo wan sîmbola xwe "Heyv" xistin ser ala Turkan jî, paş ku laşê Împeratoriya Osmanî dan ber kêrên xwe, û ji xwe re gelek peyayên navdar li Türkiye pêda kirin… Navê Türkiye taze hate pêdakirin, lê Turkan bi xwe nave Kurdistan berî wê hîngê bi sedan sal bi terzekî fermî û di fermanên sultanî de bi kar anî bû, û hîn jî dibêjin "Yao… Kürdistan yuqtir"…

Bi çewtî li nav Musilmanan hate belavkirin ku "Heyv" sîmbola Îslamê ye… Hema Pêxemberê Neteweya Musilman (*Silav lê bin*) hîç sîmbolek ji xwe re an ji leşkerê xwe re bi kar ne anî bû, ne Heyv û ne ro, ne rengek ji rengan û ne pûtek ji pûtan, an nexşek ji nexşan… Di hinek demên dewletên îslamî de heyv wekî sîmbolekê bo salnamê an bo meha Rojiyê an jî li ser minareyên mizgeftan bikar hatiye, lê hîç qudsiyeta heyvê di ola îslamî de tuneye, tevî ku di Qurana pîroz de li ser wê hatiye hewaldan bo nasîna dem û mehan…

Paş ku Turk hatin xapandin, xwestin "Heyva Masonî" bikine sîmbola teviya Musilmanan, eve jî ne rast e û xapandine… Dewleta îslamî ya tev nêz ji Mekke û Medîne e dewleta Saudî ye, û li ser ala wan ev heyv nîne…

Paş roxandina deselata dîktatorê xûnrêj Seddam Husên sala 2003 li Îraqê, alayeke nû bo Îraqê, ku bi "Heyv a Masonî" hate pêşniyazkirin, hema ew bizav bi ser neket.

Ji me Kurdan, ku em neteweyeke di piraniyê de Musilmanin, tê xwestin ku em bi va heyvê neyên xapandin, û ewên ku vê sîmbolê li ser ala Turkan, ji ber oldariya xwe an ji ber nezanînê, "Muqeddes" dibînin, bila hişyar bibin, çavên xwe vekin û hişê xwe baş bi kar bînin…